JINEOLOJÎ

DESTPÊKEK JI BO JINEOLOJIYÊ

AMADEYÎ

1

2020/2019

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Jineolojiyê ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê
- Komîteya Fotoşopê
- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, weke pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

BEŞA YEKEM 7

JINEOLOJÎ ÇI YE? 7

TÊGEHA JINEOLOJIYÊ 8

ZANIST Û ZANÎN 12

GIHAŞTINA WATEYA JIYANÊ 14

ÇIMA JINEOLOJÎ PÊWÎSTIYEK E 17

BEŞA DUYEM 23

XWEZAYA JINÊ 23

PEYVA JINÊ DI ZIMANÊN CUDA DE 24

JINEOLOJÎ Û XWEZAYA JINÊ 28

NASNAME Û HEBÛNA JINÊ 32

HEBÛNA JIN Û MÊR DI JINEOLOJIYÊ DE 36

BEŞA SÊYEM 43

AZADKIRINA ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ 43

ZAYEND Û ZAYENDPERESTÎ 44

ZAYENDPERESTÎ 48

JIYAN Û ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ (1) 53

JIYAN Û ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ (2) 58

AZADKIRINA ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ 63

BEŞA ÇAREM 67

NASNAMEYA JINÊ YA CIVAKÎ 67

JINEOLOJÎ Û ÇANDA DAYÎKÊ 68

ÇAVKANIYÊN JINEOLOJIYÊ 73

JINEOLOJÎ Û ŞOREŞA JINÊ 77

BEŞA YEKEM

JINEOLOJÎ ÇI YE?

1. **TÊGEHA JINEOLOJIYÊ**
2. **ZANIST Û ZANÎN**
3. **GIHAŞTINA WATEYA JIYANÊ**
4. **PÊWÎSTIYA JINEOLOJIYÊ**

WANE 1

TÊGEHA JINEOLOJIYÊ

Jin di xwezaya civakî de hem bi fîzîkî hem jî bi wateyî beşa herî fireh digire.

Wê demê çima ev xwezaya civakî ya pir girîng, nabe mijara zanistê?

Dema ku xwezaya jinê di tarîtiyê de bimîne, hemû xwezaya civakî jî dê di tarîtiyê de bimîne.

Li vir pirseke girîng tê kirin, çima pêwîstî bi jineolojiyê heye?

❖ **Jineolojî:** Têgeheke resen e. Ji peyva **(JIN)** a bi kurdî û **(LOJÎ)** ya latînî ku di wateya zanistê de ye, pêk hatiye.

Di sala 2008'an de ramyarê civaknasiya (sosyolojî) azadiyê Ebdullah Ocalan di parêznameya xwe ya bi navê "Sosyolojiya Azadiyê" de pêşniyar kiriye û gotiye:

"Jineolojî (zanista jinê) ya li şûna femînîzmê dibe ku baştir bersivê bide armancê. Rastiyên ku jineolojî wan derxîne ronahiyê, para rastiya ku di xwe de wergirin, diyar e ku dê ji gelek lojiyên beşên civaknasiyê ne kêmtir bin... ".

RONÎKIRIN

Feminism (Femînîzim): Gotineke fransizî ye. Tê wateya “jinperestiyê”.

Piştî şoreşa Fransayê ya sala 1789'an û heya roja me ya îro, têkoşîna ku ji bo mafên jinan ji aliyê ramyarî û aboriyî ve hatiye meşandin, bi navê femînîzmê hatiye naskirin. Cara yekem ji aliyê **Charles Fourier** (Çarilz Foriyê) ve hatiye gotin. Femînîzm bîrdoziyek e ku ji bo çarekirina bêmafî û çînayetiya di navbera jin û mêran de têkoşînê dike. Armanca wê rizgariya jinê ye.

Jineolojî:

Jineolojî li ser zanîn û rêbazên gihandina zanînê û çavkaniya wê radiweste. Di jiyana civakî de bi armanca takekesbûn û civakbûna azad, qadên zanistê ava dike.

Zanînên der barê jin, civak, gerdûn û tevahiya jiyanê de hatine girtin, bi perspektîfa jinê ji nû ve şîrove dike. Di pêşxistina van şîroveyan de, ji gelek rêzikên zanistê, ji kuliyeta Femînîstê û ji serboriyên devokî û nivîskî yên jinên şoreşger, sûdê werdigire. Tevahî zanistperestiyên ku di hizir û hişmendiya mirov û qada zanistî de parçe bûnê bi pêş dixin, jineolojî wan napejirîne.

Pênaseya jineolojiyê:

- **Jineolojî:** Di bingehê xwe de zanista jinê ye. Di heman demê de zanista civak, jiyan û hevjiyana azad e. Her wiha zanista jinê ya nûjeniya demokratîk e; ango jiyankirina bi awayekî demokratîk e.
- Jin çawa, li ku derê, çima, bi çi û bi destên kê ji jinbûn û jiyanê, hat dûrxistin? Zanista derbirîna van a li ser civakê lêkolîn dike. Jin û jiyanê bi wateya xwe, ango bi jiyan û jinbûnê ve digihîne hev.
- Li ser sedem û çavkaniya qirkirina jin û civakê radiweste, lewma ew zanista rawestandina qirkirina jin û civakê ye. Jineolojî berî her tiştî dê bibe zanista derbaskirina jiyana civakî ya xetimî û ya ku di çarçoveya desthilatdariyê de dijî. Armanca vê zanistê; dermankirin, sazkirin û paqijkirina her tiştên ku heqîqeta jiyana civakî qirêj dikin û dibirin. Ji ber vê yekê dê bi paqijiyeke hişmendî û giyanî dest pê bike. Hişmendiya mirovan, bi taybetî jî ya jinan, heger bi hêrsa desthilatiyê xerab bûbe; her roja ku em dijîn bobelat e. Hişmendiya jinê ji desthilatiyê, hemû bîrdoziyên desthilatiyê û dirûvên hizirî ku ji wan bandor bûne, azad bibe, ev encax gengaz dibe.

- Ew zanista ku bi rêya jîndarkirina vê armancê, bi pêş dikeve. Dema ku em hebûna jinê ya di nava jineolojiyê de digirin dest, em di wê cudahiyê de ne ku pêwîstiya vê qadê bi lêkolîneke pir berfireh û jidil heye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Jineolojî ew zanista ku kesayet, hebûn û azadiya jinê pêk tîne. Lêkolîn û guftûgo bike.

2. Çima jineolojî girîng e? Binirxîne.

3. Jineolojî dê çawa bi pêş bikeve?

4. Jineolojî çi lêkolîn dike?

WANE 2

ZANIST Û ZANÎN



Zanist, hizirîna mirov a li ser civak, pêşketinên heyînan û cîhanê ye, her wiha girêdana di navbera hemû heyînan de bi pêş dixe.

Mirov di encama zanîna zanistî de digihêje wateya hebûna xwe. Mirov ji xwe, ji civaka xwe, ji çanda xwe û ji xwezayê hez dike.

Mirov bi zanîna zanistan digihêje hişmendiya civakî ya giştî û hevbeş. Ev hişmendiya civakî ya hevbeş, bi mirovan re guhertin û veguhertinê çêdike. Ji bo vê, mirov çi qas zanistan zanibe, ew qas bi pêş dikeve û bi hêz û civakî dibe.

Zanist şîrovekirina wateyê ye. Wate kombûna heqîqetan e; heqîqet eşq e û eşq jiyana azad e. Zanista ku li dora jinê were bipêşdebirin, dê bibe gava pêşî ya ku ber bi civaknasiya rast ve were avêtin.

Zanîn û çavkaniyên zanînên azad:

Hemû berhemên serpêhatî û hizirîna civakê, dibin zanîn. Dema ku di navbera zanînan de girêdaneke rast were bipêşxistin, encamên baş tên girtin. Rêgeza zanînê ya bingehîn, sinc e. Zanîna rast û baş bi rêveberiya civakê bi pêş dikeve. Mîrateya (Irss) ku civakîbûyînê daye avakirin, di heman demê de zanîna mirovan e.

Pêşniyarkirin, avakirin û bipêşxistina jineolojiyê, li ser zanistên civakî bi tena serê xwe rexneyek û destlêwerdanek e. Heger ji aliyê pênase, wergirî, pêkhateyên zanînê, awayên zanîn û lêkolînê û rêbazên wê ve, xwe rast birêxistin bike û civakî bibe, em dikarin bibêjin ku di derbaskirina aloziya ku îro zanistên civakî dijîn de, dê bibe hêza çareyê. Bi jiyana ku

dê li derdora jinê bi pêş bikeve, divê mirov neheyire ku dê zanista civakî ya li derdora jineolojiyê jî, bi pêş bikeve.

Koka tevahiya zanistan civak e. Yanî heger em hemû civakî bin, wê demê em civak in. Civak jî afirîneriya jinê ye. Zanist, zanîn û zanatî bi destê jinê, bi giyan, dil û hezkirina wê, dikare asoyên xwe berfireh bike û dahênanên (keşf) nû bi pêş bixe.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Heqîqet, eşq e û eşq jiyana azad e. Vê hevokê rave bikin.

2. Zanîna rast û baş, dê çawa bi pêş bikeve?

3. Pêşxistina jineolojiyê destlêwerdana çi ye?

WANE 3

GIHAŞTINA WATEYA JIYANÊ

"Divê jiyan di ser hemû nirxan re bê girtin. Erkê wê yê bingehîn jî têgihaştin e. Têgihaştin, jiyankirin e û jiyankirin ji bo têgihaştinê ye." Ev gotinên ramyarê civaknasiya azadiyê Abdullah Ocalan in, ji bo pirsa "çima jineolojî" bersiveke baş e. Ji bo ku nezanîn û korîtiya di jiyanê de ji holê rabe, divê jineolojî bi pêş bikeve. Ji ber ku jiyan bi xwe nirxan dide mirovan, ji ber vê yekê di ser hemû nirxan re ye.

Spinoza (fîlosofekî Holandayî ye) dibêje: **"Têgihaştin, azadî ye."** Di qonaxeke diyar de, ya hemû jinên ku di lêgerîna azadiyê de tê dikoşin, divê gotinekê bi giranî bigirin dest û tê bigihêjin. Ji ber ku mirov çi qas cîhan, civak, malbat û têkiliyên wê nas bike, her wiha hebûna xwe ya bi van hemûyan ve girêdayî, tê bigihêje û watedar bike, dikare ew qas azad bibe. Ji bo mirovên ku tê nagihêjin, ev têkilî û girêdan, dê her tim dest û pêyên wan bi qeyd û bend bin; asteng bikin, an jî koletiyê biafirînin. Ev dema ku em tê de dijîn, giyanê ezezîtî, takekesî û qirkirina civakî tê de serwer in. Çesipandina (isbata)

herî berbiçav a ku windabûna rastiya jiyanê li ber çavan radixe, ew qutbûna wê ji sinc, wekhevî û azadiyê ye, her wiha kuştin û qirkirina zarok, jin û civakê ye.

Jineolojî û raza (sir) jiyanê:

1. Berî her tiştî dê ji nû ve li ser pênasekirina jiyana civakî bixebite. Her wiha dê dahûrandin û rexneyan li jiyana sexte ya ku ji mêr û jinê re hatiye afirandin bike. Dê hîn bêhtir dahûrandinan li ser têkiliyên di navbera jiyan û azadiyê, jiyan û wateyê û piştre jiyan û xwezayê de jî bike.
2. Jin an jî mêr bêyî civaka xwe nikarin bijîn. Dema me ya ku tê de takekesî û civak hatiye qirkirin, her kêlî bi vê heqîqetê diqîre. Ji bo rêzdariya ji felsefeya azadiyê re be jî, heqîqeta ku divê destpêkê em tê bigihêjin, ev e. Ji bo ku em bigihêjin raza heqîqeta jiyanê, pêwîst e ev heqîqt were parvekirin.

3. Mirov û civaka ku wateyê nedin jiyanê, dê di nava bêwateyiyê de bifetisin û pir zehmet e ku bigihêjin raza jiyanê. Em vê li ber çavan bigirin û bigihêjin vê razê, tevî hemû rastiya jiyanê ya biêş û îşkence.

Em pirsa "kî ye?" ji xwe dikin.

Em bi dilê xwe, pêhesînên xwe û hestên xwe dizanin ku ew jin e. Ji ber vê yekê jî em dibêjin: "Kuştiya qirkirinan jin, civak û xweza be jî, dîsa dê jin bigihêje raza jiyanê." Di her derê de hewldanan dikin. Ji bo ku ev hewldan zêde bibin, bên birêxistinkirin, çalak bibin, ber bi jiyanê ve biherikin û jiyanê biguherînin, berê hemû hewldanên xwe didin wê.

4. Êrîşên ku nûjeniyê li ser dîroka me, li ser moralê me, gerdûna me, li ser tevahiya cîhana me (hestî û hizirî) û nirxên me yên jinîtî û mirovî kirine, ji bo ku zanebûn û hêza zanîna

jiholêrakirina hilweşînên di hemû heqîqetên ku em pê em in ji holê rabe, diafirînin.

5. Heger wate tune be, jiyan jî tune ye! Heger em bi çavên jinê ji nêztir ve li rastiyan binêrin, em bawer in ku dê hêza me ya wateyê xurtir bibe. Lê tu carî girêdanên wate, jiyan, civak û jinê qut nekin…

Mînak: Di sala 2018'an de piştî dagirkeriya dewleta Tirk ji Efrînê re, jinên Efrînê yên ku li wargeha Şehbayê û di hundirê konan de dijîn, gul û şînahî li derdora xwe çandin. Bi rêya xweşikkirina derdora xwe, wate dane jiyanê. Her wiha li derdora xwe civakbûyînek ava kirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Girêdanên wate, jiyan, civak û jinê çawa ne? Binirxîne.
2. Spinoza ji bo têgihaştinê, çi gotiye?
3. Girêdana wateyê ya bi jiyanê re çi ye?

WANE 4

ÇIMA JINEOLOJÎ PÊWÎSTIYEK E

Zanista pozîtîvîzmê hişên seqet û parçebûyî, afirandine. Di rewşeke wisa de, bi peyva "**jin**" û peyva "**lojî**" ya latînî dê nûbûnek û hin tiştan li jiyanê zêde bike?

Ji bo ku ji vê bawer nekin, goristanên berfireh li ber me hene ku der barê cîhana akademîk, zanista pozîtîvîst, qadên zanistê yên cuda ku parçe bûne û pratîkên teoriyên cuda de ne. Ev qas tiştên jevketî, hatine qedandin, qirêjkirin, jirêderxistin ku gava mirov dinêre, dilê mirov sar dibe û ji mirovahiya xwe şerm dike.

> **RONÎKIRIN**
>
> **Pozîtîvîzm:** Li gorî pozîtîvîzmê, zanîna saxlem û pêbawer tenê dikare bi rêyên ceribandinê bên bidestxistin. Pêşnêrînên ku bi ceribandinê nehatine pejirandin, weke metafîzîk tên dîtin.

Jineolojî, bi armanca ku bibe zanista jiyanê, zanista jinê, zanista jiyana civakî û zanista hevjiyana azad, derdikeve. Wisa be, divê bi pirsên ji van wêrektir û xwerûtir bibe bersiv.

Jineolojî çima "dikare bibe derketineke bingehîn?" Behane û sedemên pênasekirin, guftûgokirin û avakirina jineolojiyê çi ne?

Çi dipejirîne û çi napejirîne?

Ji bo ku jineolojî reh, bingeh û rêgezên xwe xurt bike, divê bi wêrekî bersiva van pirsan bide.

Sedemên Pêşketina Jineolojiyê:

Di dîrokê de, jinan pergaleke civakî ya bi pêşengiya jinê ava kiriye, rêxistin kirine û dane meşandin. Di vê pergala xwe ya civakî de aştî, dadî û berhemdarî (bereket) serwer kirine.

Bingehê gelek vedîtinan di Serdema Neolîtîkê de danîne. Îro jî gelek karên ku dibêjin: "Karên jinan" in û biçûk dibînin, a rastî xwe dispêrin hejmar, bîrkarî, hesabên zirav, eyarkirinên demê û zanînên jîrekiya dahûranî û hestiyarî. Hişmendiya mêrê serdest, bi fêlbaziyeke mezin, ev hemû desteser kirine û kirine mezaxa (xerca) pergala xwe. Ji bo desteserkirina wî ya li ser jinê neyê têgihaştin, bi gotina **"karên jinê"** ew biçûk kiriye, karîkaturîze kiriye. Yan jî gotiye: "**Karê ku ne karê te ye, çima tu dikî!** Bi hevîrê destên xwe ve mijûl bibe û têkilî karê mêr nebe!"

Mêr nizane ku havênê hevîr ê ku bi destên jinê hatiye çêkirin, yek ji vedîtinên kîmyayê yên destpêkê ye. Heger ne ji hevîrê destê wê be, hemû mêr nikarin ji birçîbûnê gavekê jî biavêjin.

Pêwîst e bi vî awayî li jinê neyê nêrîn, ji ber ku di xwezayê de jî jiyan hevbeş e. Ev tê wateya ku divê hem jin, hem jî mêr rêzgirtinê bidin keda hev û du.

Li ser van sedeman jineolojî bi pêş dikeve:

Sedemên ku xwe dispêrin aliyê hundirîn: Cîhana jinê û gengaziya ku di vê cîhanê de heye, ji bo ku derkevin holê, pêwîst e bi mirovahiyê re werin parvekirin. Di pêvajoya ku em tê de ne, ev yek ji pêwîstiyên herî lezgîn ên mirovahiyê ye. Divê giyanê jinê, dest li vê cîhanê bide. An jî ev cîhan, bi giyanê jinê ve bê hûnandin.

Sedemên neyînî: Tundiya ku jin pê re rû bi rû dimîne, dagirkerî, biçûkdîtin, tunekirina bi bîrdoziyê, mandelkirin, qirkirin û hwd, sekinandina wan pêwîstiyeke lezgîn e. Yan jî

cîhan dê bibe gerestêrkeke ku xwe bi xwe dadiqurtîne û mirovahî bibe koma nezanên ku di bêhişiyeke domdar de dara ku li serê ne, dibirin.

Armanca jineolojiyê:

Ji bo ku jin berê xwe bidin jineolojiyê, bi sedan nirx û sedemên erênî hene û dikarin li ser wan nirxan bilind bibin. Pêwîstî heye ku jin wan nirxan yek bi yek bibînin û bi nav bikin.

Rûmeta ji wan vedîtinan bûye para jinê, heke bi derengî be jî bijîn, pêwîst e çanda fedîkirinê ya ku şaristaniyê li derdora nasnameya jinê hûnandiye, parçe bikin. Berî her tiştî û ya girîng ew e ku gerdûn, cîhan, xwezaya ku ziyanê lê dikin, civaka tê qirkirin, cîhana jin û zarokan, pêwîstiya wan bi gihandina van nirxên erênî ku biçûk hatine dîtin û desteserkirin, heye.

Dê bigihêje nirxên erênî yên ku derxe holê û dê bi pergal û arşîv bike. Ji bo veguhere rêxistinbûnê, dê zanabûnê xurt bike û girêdayî pêşketinên zanistî yên ku bi hiş û hestê jinê dixebitin, bike.

Yên derneketine holê, ji bo ku derkevin holê, dê hewl bidin ku avakirina rê û rêbazên diyarkirina şêwaz, plan û tevgera guftûgoyeke hevbeş a bi jinên cîhanê re bi pêş bixin. Ew ji bo hewldana van hemûyan pêwîst e û destpêka wê lêkolînkirin û rêxistinkirina lêgerînvaniyê heye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima pirî caran karê ku jin dike, bi çavekî biçûk lê tê nêrîn?

2. Çima jineolojî dixwaze têkiliya jin û jiyanê xurt bike?

3. Di dema îro de, jin dikare malbat û civakê bi rê ve bibe, çawa?



Jin stûnên malan in…

Ev wêne ne tenê hunereke Yûnanî ye.

Ev dide xuyakirin ku piraniya şaristaniyan li ser milên jinan hatine avakirin.

BEŞA DUYEM

XWEZAYA JINÊ

1. **PEYVA JINÊ BI ZIMANÊN CUDA**
2. **JINEOLOJÎ Û XWEZAYA JINÊ**
3. **NASNAME Û HEBÛNA JINÊ**
4. **DI JINEOLOJIYÊ DE HEBÛNA JIN Û MÊR**

WANE 1

PEYVA JINÊ DI ZIMANÊN CUDA DE

Her ku jineolojî bi hemû qadên xwe bi pêş bikeve, em ê der barê jinê de bigihêjin agahiyên hebûnê yên baştir. Bi awayê zanista peyvan (etîmolojî), ev mijar dê ji peyva jinê dest pê bike, her wiha bi awayê hebûnê (ontolojîk) wateya xwezaya jinê, bi lêkolîneke hûr û kûr, bigire dest.

> **RONÎKIRIN**
>
> **Etîmolojî**: Bêjenasî, yan jî peyvnasî. Mijara etîmolojiyê wate û beşek ji ziman e. Wekî peyv tê wateya zanista heqîqîtê an zanista bingeh. Li koka wateyên peyvan digere.

Girîng e ku mirov di her zimanî de zanibe peyva jinê ji kîjan kokê hatiye daraştin. Her wiha di qonaxên cuda yên dîroka civakî de nav û pênaseyên li jinê hatine kirin, çi bûn û têgihaştina wan jî girîng in. Ji ber têgehkirin, nîşaneya fêmkirina (derbirîna) jiyanê ye, jiyan çi be, ziman jî wê nîşan dide.

> **RONÎKIRIN**
>
> **Ontolojî** yan hebûnnasî, heyînnasî, felsefeya xwe ji hebûnê digire. Ji beşa wê felsefeyê ye ya ku dixwaze heyînê fêm bike û lê vedikole da ku zanibe derûnî û sedema yekem ya heyînê çi ye? Her wiha pirsa, gelo heyîn heye, yan na ji xwe dike. Li ser hatina holê, xweza, avahî û çêbûyna heyînê radiweste.

Peyva Jinê:

Peyva jinê di ferhengên kurdî de, bi zaravayê kurmancî jin, jinik, afret (mirova mê ya gihaştî).

Xanim, xatûn: Weke nasnav e.

Hurmet: Kesa ku ji aliyê dayîktî û gerandina kar û barên malê ve xwedî jêhatîbûn e.

- Bi zaravayê zazakî: Cin (gen) (pirhejmariya wê; cenî).
- Bi tirkî kadin (mirova gihaştî ya ji zayenda mê) ji peyva zimanê gelê sogdî ku gelekî Îranî ye, ji xwaten-hatûn hatiye girtin, derbas bûye.
- Bi erebî: Mera (pirhejmariya wê nîsa ye)
- Bi suryanî: Asto
- Bi zaravayê soranî: Afret
- Bi hûrîkî: Aşt
- Bi sumerî: Nîta
- Bi farisî: Zen
- Bi ermenî: Gîn
- Bi rûmî: Gyme
- Bi almanî: Frau
- Bi latînî: Femîna
- Bi fransizî: Femme, medam
- Bi çînî: Gyn
- Bi yûnanî: Gyno
- Bi îbranî: Îşşa

Di kurdî û hin zimanên din de, koka peyva "jin" û "jiyan", xweza û azadiyê heman e.

- Bi kurdî jîn, jiyan, şên, giyan, cîhan, cih ji heman kokê tên. Her wiha peyvên jîndar, jîndarî, jînde, zindî û peyvên jin û jiyan ji heman kokê tên.
- Peyva jiyanê, di sumerî de ti û tî ye.
- Bi sumerî di wateya azadiyê de "amargî", tê wateya vegera dayîkê jî.
- Bi **erebî**, heyat di wateya jiyanê de ye, ew jî peyveke mê ye.

Bi **spanyolî** peyva "la vîda" ango jiyan jî, peyveke mê ye. Bi **farisî** peyva "jiyan, zendegî" û "jin, zen" ji heman kokê ne.

Bê guman girîng e ku mirov di gelek zimanan de vê lêkolînê bi pêş bixe.

Her civak, di pêvajoyên ku berî zayendperestiya civakî bi pêş bikeve, ji bo hebûna jinê, kîjan têgeh bi kar anîne? Mirov cudahiya di navberê de lêkolîn bike, ji bo gihaştina heqîqeta jinê, dê gavên girîng bin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Pênc navên mê yên ku tên wateya jiyanê, binivîsin.

2. Peyva jiyanê bi sumerî tê çi wateyê?

3. Peyva jinê bi kurdî tê çi wateyê?

4. Her xwendekarek li ser wateya navê xwe lêkolîn bike.

WANE 2

JINEOLOJÎ Û XWEZAYA JINÊ

Wateya xwezaya jinê çi ye?

Di roja me ya îro de têkiliya jin, jiyan û civakê, hin bûyer in ku herî zêde hev û du bandor û diyar dikin. Asta diyarkirina jinê, li ser bingehê rast an jî şaş nayê guftûgokirin.

Taybetiyên xwezaya jinê:

Di xwezaya jinê de hinek taybetî derdikevin pêş. Ev taybetî berî desthilatdariyê weke hêza jinê hatiye destgirtin. Lê piştre weke kêmasî hatiye şîrovekirin. Hinek ji van taybetiyan em dikarin wisa rêz bikin: jîriya hestiyarî, heyvik (regl), zayîn, enerjiya herikbar, xurtbûna hisê şeşem û girêdana bi xwezayê re û hwd, taybetiya girêdana jin, jiyan, xweza û civakê nîşan didin û mijarên lêkolînê ne.

Jin gihaştiye rastiya hêz, kesayet, xweza, enerjî û zanebûna derdora xwe. Ji ber vê yekê divê jin bi xwe, pênaseya xwe bike. Ji ber ku ya xwe pênase neke, dê hinên din wê pênase bikin. **Mary Daly (Marî Dalî) dibêje:** "Heybera bisêhr a ku pêkhatina jinê çêdike, ″ jinerejî ″ ango enerjiya jinê ye".

RONÎKIRIN

Jîriya Hestiyarî: Xwenaskirin, birêvebirina hestên xwe, xwexistina şûna kesek din û danîn empatiyê, di têkiliyên civakî de jîrbûyîn û çêkirina hevsengê bi xwezayê re.

Mary Daly

Ew zanyareke Amerîkayî ye. Di beşa biyokîmyayê de erkdar bûye.

Jineolojî, dê enerjiya herikbar a pozîtîf ku bawer dike di xwezaya jinê de heye, lêkolîn bike.

Gotina balkêş: Jin di xwezayê de parçeya hestiyar a herî zêde dixebite…

Jixwe ev cudahiya enerjiyê cudahiya form û avahiyên xwezayî diyar dike. Enerjiya di form û xwezeya jinê de ji ya di xwezaya mêr de cuda ye. Enerjiya ku jin hildigire, hem zêde ye, hem jî taybetiya enerjiya wê cuda ye. Forma jinê rê li ber vê cudabûnê vedike. Di xwezaya civakî de enerjiya mêr a ku vediguhere mekanîzmayên desthilatdariyê, bi form û şêweyên xwezayî bi teşe dibe. Enerjiya li cem jinê bi giranî nabe form û şêwe nagire. Enerjiya wê di rewşa xwe ya herikînê de dimîne, ji ber xwezaya jinê û tişta ku li ser beden û hundirê wê tê guhertin. Zindiya herî zêde nêzî jiyanê, jin e. Jin, jiyanê di bedena xwe de vedihewîne û dikare jiyanê biafirîne. Sedema vê yekê xwezayî ye û nayê zanîn.

Bi hisa xwe xweza, jiyan û mirovan nas dike. Tevî ku ji aliyê hişmendiya mêrê desthilatdar ve hatiye biçûkxistin, lê dîsa jî jin bi nirxên ku dide jiyanê û bi xurtbûna hîsê ku bi jîriya xwe û rihê xwe wateyê dide jiyanê, dikare ava bike.

Margaret Fuller

Rexnegira wêjeyî, rojnamevan û parêzvana mafên jinan a Amerîkayî ye.

Margaret Fuller (Margrît Faoler) dibêje: "Di jinê de jêhatîbûneke taybet, xwezayeke bielektrîk û gurbûneke elektrîkê heye." Mêr, ne xwediyê van taybetiyan e û pergala mêr nahêle ev derkeve holê. Mejiyê jinê, ji mejiyê mêrê ku "zêdetir li ser

dahûrîn û vedîtinê rêyeke 'birêkûpêk' digire" cudatir e. "Karakterekî cuda yê '**empatî**' ya ku ji giyanê derdora xwe tê digihêje, heye." Bi saya vê cudahiyê, jin dizane ku dê karibe ji gelek aliyan ve li mijarekê binêre. Ajoyên jinê yên ku bi hezarên salan dibin çavkaniya biçûkdîtina wê, êdî tê digihêje ku şêwazê xebitîna daneyên mejiyê wê ye.

Gelek encamên zanista biyolojiyê yên ku der barê xwezaya jinê de danîne holê, tekez dikin ku fîzîka jinê, mêr digire nav xwe, lê fizîka mêr a jinê nagire nav xwe. Berovajî gotinên efsaneyî û hin pirtûkan, jin ji fizîka mêr nayê. Ya rastî mirovahî bi hezarên salan bi vê zanînê jiyaye. Daneyên zanistî, nû digihêjin û nîşan didin ku xwezaya jinê navend e; tevahiya jiyanê girêdanên xwe û jinê qut nake. Mêr, hebûnek e ji jinê çêdibe.

Divê jin çawa dest bi vê hizirandinê bikin, êdî li ser rêya rêwîtiya hebûna xwe bin. Di meşa vê rêyê de, jin hêza xwe ya empatiyê û behreyên xwe yên ahengê yên mezin, dahênan dikin. Jin zanyariyên xwe yên narîniyên herî biçûk ên jiyanê, ji kesera di awirên mirovan de bigire, heta bi pêhesînên ku em bi wan nîşaneyên hêrsdarî û firehiya li derdora xwe dibînin û bi gelek taybetiyên xwe yên xweşik ji nû ve nas dikin.

RONÎKIRIN

Empatî: Ew hîskirina kesên derdora xwe, xwe xistina şûna wan û bi vî awayî gihaştina hest û hizirên wan e.

Xwezaya jinê li derdora civaka azad xuya dike û pêşketina azadiya jinê pêşketina azadiya civakî ye. Ev peywendî kilîla pêşketina mijarên hebûna jinê ye. Jineolojî ji bo ku xwezaya jinê pênase bike dê li ser rêbazên felsefî, hunerî û wêjeyî kar bike.

Ev yek li ser bingehê rastiya sincî ya nirxên civakîbûna jinê ye û bingehê wê dadî, azadî û wekhevî ye. Baweriya ku ji

hêza jinê tê, dê qirkirinên li ser jinê yên ku roja îro pêk tên, bide rawestandin û nasnameya wê bi pêş bixe. Li ser bingehê azadî, hezkirin, hişmendî û zanînê bi rengekî zanistî bi tevgerên jinê re, bên parvekirin. Ev yek, dê bigihêje wate û jêdera hebûn û azadiya jinê. Pêşketina jineolojî dê di vê mijarê de, qonaxeke girîng be.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Tekeziyên zanista biyolojiyê yên der barê xwezaya jinê de, binirxîne.

2. Çima pêwîst e jin hêza xwe nas bike?

WANE 3

NASNAME Û HEBÛNA JINÊ

Di çavkaniya pirsgirêkên civakî yên giran ên di roja me de, pênaseyên jinê yên bi hişmendiya ku taybetiyên wan ên mêr, zanist, felsefe, ol û hunerê tên kirin, hene. Jiyana ku li gorî van pênaseyan hatiye bipêşxistin; li gorî vê yekê jineolojî, çavkanî û çarekirina pirsgirêkên civakî, bi pênaseya jinê û li gorî çarçoveya rista wê ya di nava jiyanê de, lêkolînkirinê bingeh digire.

HEBÛNA JINÊ

Hebûna jinê bi tunekirinê re, rû bi rû ye. Pirsgirêka jinê ya pêşî ne azadî ye, lê belê xweparastin e. Ya hebûna wê tune be, azadiya wê jî tune ye. Azadî, tenê bi hebûnê gengaz dibe.

Mînak: Gul, tevî ku lawaz e jî, lê dikare xwe bi stiriyên xwe, biparêze. Pêwîstiya jinê jî bi parastinê heye.

Ev peyitandin, ji aliyê têkiliya hebûn û azadiyê ve pir girîng e. Îro pergaleke desthilatdar heye û dixwaze hebûna jinan bi fizîkî û bîrdozî tune bike. Wisa be li hemberî vê pergalê, em ê destpêkê hîn bibin ku bi derfetên xwe, hebûna xwe biparêzin. Ji bo jinek karibe hebûna xwe biparêze, divê hebûna xwe nas bike û pênase bike. Divê çêbûn û hebûna xwe, bi têgîn û pênaseyên xwe bi nav bike û watedar bike.

Ji ber vê yekê, destpêkê pênasekirin û diyarkirina jinê û rola wê ya di nav jiyana civakî de ji bo jiyaneke rast, bingeh e.

Em vê darizandinê, ji aliyê taybetiyên jinê yên biyolojîk û cihê wê yê civakî ve diyar nakin. Weke hebûn, têgîna jinê girîng e. Jin çiqas bê pênasekirin, pênasekirina mêr jî ew qas gengaz dibe.

Rista jinê ya di dîroka mirovahiyê û jiyana civakî de hema bêje ji %98 di asta pêşengtiyê de diyar e. Ev, ne demeke wisa ye ku bîra civakî bi hêsanî ji bîr bike.
Ji bo jin karibe bigihêje hêz, vîn û cewherê xwe divê hin mijarên ku di jiyana civakî de asteng û zehmet in, derbas bike.

Zanista hebûnê (ontolojî) çawa jinê rave dike? Nasnameya jinê çawa pêk tê?

Ji jinê re hatiye gotin ku afirîndeyek e ji aliyê fîzîkî ve kêm e, lê hemû daneyên zanistî çespandine (îsbatkirin) ku destpêkê nasnameya jinê bi pêş ketiye.

Ev pirs, ji demên hişmendiya mêrê desthilatdar û sazîbûnên wan ve yên ku jin têk birine û heta roja me ya îro, pirsên herî dijwar û bişewat in.

Ji wê rojê ve " hebûna ku herî zêde mêr biçûk xistiye, jin e."

Jin, di efsaneyên hişmendiya mêrê desthilatdar ê ku di ol, huner, felsefe û zanistan de afirandiye, her tim bûye hebûneke tirsê û bi pênaseyên erzan ên bîrdoziyê hatiye nasîn.

Nasnameya jinê çawa hatiye pênasekirin?

Nasnameya jinê a ku hatiye pênasekirin, destpêkê li gorî daxwazên pergalên desthilatdar û dewletperest, piştre jî li gorî daxwazên hişmendiya mêrê desthilatdar hatiye pênasekirin. Xwezaya pergala **baviksalarî (serdema desthilatdariya mêr)**, bi koletiya jinê re xwedî dibe. Ji bo berdewamiya hebûna xwe, divê pergal bênavber koletiya jinê çêke. Ji bo vê jî, ji çand û hunerê bigire heta hemû qadên medyayê, ji aboriyê heta ramyariyê, hemû pergal ji bo ku vê koletiyê xwedî bikin, dixebitin. Ji ber ku hemû olên yekxwedayî, di ser hilweşandina xwedawendiya jinê re, bi pêş ketine, jixwe bi hezarên salan bang dikin ku koletiya jinê nasnameyeke xwezayî ye. Ji bo ku civak bi awayekî din nehizire û lêpirsînê neke; baweriya ku xwezaya hebûna jinê ev e, her tim tê kûrkirin. Dema ku civak, qadên hizirîna bi azadî û jiyanê bi dest bixe, jixwe bi serboriyên xwe dizane ku ev ne wisa ye. Jinên gerîla yên têkoşer ku di sedsala 20'an de cih digirin, di ramyariyê de pêşengiyê dikin. Di encama têkoşîneke mezin de û di her qada zanistê de dixebitin; hemû pêwîstiyên civakê bi kedeke mezin hildiberînin û vê bawerî û bangaşeyê ji binî ve dihejînin. Lê hîn destpêka kar, rave dike.

> **RONÎKIRIN**
>
> **Baviksalarî:** Pergala civakî ya ku xwe dispêre desthilatdariya mêran. Bingehê vê pergalê li ser hizira serweriya mêr çêdibe. Nijad li ser bav tê diyarkirin. Di vê pergalê de rêzdayîna mêran li gorî jinan zêdetir e.

Ji ber vê yekê, girêdana xurt a di navbera jin û civakîbûnê de ye. Li ser vî bingehî, yek ji rêgezên jineolojiyê ya ku di pêşxistina bingehê azadiya hebûna jinê de bingeh bigire, ev e: Ew taybetiyên xwedawenda dayîk ên xurt ku

hatine belavkirin û dixwazin tune bikin, di nasnameya jinê de ji nû ve sentez kirine.

Ji bo ku jin karibe di têkoşîna azadiya xwe de bi biryar be û bi pêş bikeve, nasnameya xwe ya ku di tevahiya dîrokê de bi taybetiyên cuda û bedew bi pêş ketiye, di kesayeta xwe de sentez dike. Her wiha jin dikare senteza jineke ku hemû dilpakiyên xwedawendiyê, pakbûna firişteyan û giyanê ku qirêjiyên vê cîhanê negirtine, hilbigire.

Di heman demê de dikare gelek taybetiyên jinê yên dîrokî û xurt, li vê sentezê zêde û dewlemend bike. Dikare li dijî mewdankirin, kêfxweşkirin (muta), yan jî kuştina li ser nasnameya jinê hatiye sepandin, têkoşînê bike. Jin dikare giyan û hişmendiya demên tê de nasnameya xwe ya resen (esîl), serhildêr û azad ku bûye hêza çareyê, di rastiya xwe ya civakî de rojaneyî bike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hebûn çi ye?

2. Sedemên ku hebûna jinê lawaz kirine çi ne?

3. Nasname ji bo jinê çima girîng e?

WANE 4

HEBÛNA JIN Û MÊR DI JINEOLOJIYÊ DE

- Hebûn du aliyên wê hene; yek jê jin û yê din jî mêr e. Jineolojî, di vî warî de guftûgoyên xwe, bi zanebûna ku xwezaya jin û mêr, xwezayên ji hev cuda ne, dike.

Divê em karibin jinîtî û mêraniyê jî, ji aliyê rastiyên hatine avakirin ve bixwînin. Lê di heman demê de, weke xweza û nasnameyên di destpêka civakîbûnê de; hebûn û sergihayîkirina wan ji hev re, bibînin. Li gel tevahîkirin û dewlemendkirina jin û mêr, serwextbûn (têgihîştin) jî girîng e.

Divê em peyama bingehîn ji efsaneyan derxin, pêwîst e her du zayend bibin sergihayîkerên hev. "Li gorî ku jiyaneke bê jin nabe; bêyî mêr jî nabe, rizgarkirina jiyanê, rizgarkirina jinê neçar dike." Ev divêtî ya diyalektîka pêşketina gerdûnê ye.

Bobelata ku îro tê jiyankirin; dijberîhevkirin û biyanîkirina xwezayên jin û mêr e.

Weke ku Simone De Beauvoir (Sîmon Dê Buvwar) dibêje: "Mêr wek mirov tê pênasekirin û jin weke mê pênase dikin. Dema ku jin weke mirov tev digere dibêjin lasa mêr dike."

Simone De Beauvoir: Nivîskar, ramyar, fîlozofa hebûnê, siyasetmedar û jineke femînîzm e.

Bandora desthilatdariyê li ser têkiliya di navbera jin û mêr de heye.

Şaristaniya desthilatdar, ji bo ku li ser hemû zindiyan serwer be û kedxwariyê bike, bi hezarên salan di navbera jin û mêr de biyanîbûn kûr û berfireh kiriye. Her wiha di navbera mirov û xwezaya yekem de cudahiyên mezin çêkiriye.

Jixwe hizira ku jin û mêr hev û du sergihayî dikin, ya rastî xwe dispêre hizira ku mirov û xweza hev û du sergihayî dikin. Bîrdoziya baviksalariyê, dijminahî û cudakariya di navbera jin û mêr, mirov, xweza û gerdûnê de afirandiye. Dîroka vê rewşê, mijareke ji aliyê jin û mêrên ku têkoşîna azadiyê dimeşînin ve,

divê bi taybetî bê destgirtin û lêkolînkirin. Di roja me de xuya ye lêkolînkirina dîroka çêbûna hebûna jinê û gihaştina nasnameyên jinê hêmaneke pir girîng e. Efsane, ol, felsefe û zanistê ne tenê biçûkirina jinê, lê belê zayendperestiya civakî û baviksalarî jî afirandine. Her wiha mêr jî ji rastiya xwezayî, civakî û azadîxwaz qut kirine; bi qasî ku kesayeta xwe bide windakirin, desthilatî par û bertîl dane mêr.

Çima divê hebûna mêr were lêkolînkirin?

Di têgihaştina xwezaya jinê de, rêbazeke din a bingehîn heye, ew jî lêkolîn û vekolînkirina xweza û ontolojiya mêr e. Ev mijar, mijareke ku destpêkê divê mêr li ser raweste û di lêgerîna azadiyê û çarçoveya hevjiyana azad de, were parvekirin. Lê di têgihaştina mêr de pirsgirêk û zehmetiyên jidil hene, dema ku zanibe pirsgirêka wî ya azadiyê heye. Ev jî, ji pirsgirêkên ji dîroka mêraniya îro ya ku hebûna wî di navbera koletî û desthilatiyê de parçe bûye, ne qut e û serbixwe ye. Her jina ku di lêgerîna azadiyê de ye, herî kêm bi qasî ku der barê xwezaya jinê, pirsgirêkên wê yên ontolojîk û rastiya wê de zana dibe, divê der barê xwezaya mêr û ontolojiya wî de jî, lêkolîn û lêhûrbûnê bike û li ser bingehên guherîn û veguherînê têkoşer be. Di vê mijarê de jî, jineolojî hewl dide, bigihêje guftûgo, lêgerîn û hewldanên ku li tevahiya cîhanê belav bûne. Her wiha hem bi wan re hevbeşiyê bike, hem jî serpêhatiya xwe û encam û daneyên derketine, bi wan re parve bike. Xwezaya mêr, pirsgirêkên wî yên hebûnê û mijara rêgezên çêbûna hebûna mêrê azad, destgirtineke xweser û weke pêdiviyekê xwe disepîne. Ji ber ku ji destpêkê ve serpêhatiya jineolojiyê ji bo azadiya jinê, têkoşîna avakirina mêrê azad û jina azad bû, bi hişmendî û çalakvaniyeke

azadîxwaz a her duyan, sergihayîkirina hev bû. Vê sergihayîkirinê jî, civaka azad armanc girt û digire.

Bi zimanên cuda peyva mêr:

- ❖ Zilam, peyveke erebî ye. Koka peyva zilam û zilm wekhev e û ji tarîtiyê tê. Di gelek herêman de li şûna peyva mêr, peyvên cuda jî tên bikaranîn.

Gelo ev nav çawa hatine şîrovekirin û çi rastî di wan de veşartî ye?

Bi kurdî hin navên ku li mêran tên kirin:

- ❖ Mêr: mê-r, ji peyva mê hatiye çêkirin. Mê di wateya zayenda jinê de ye. Ji ber ku mêr ji jinê çêdibe, navê wî jî ji "mê" hatiye çêkirin.
- ❖ Camêr: Ciwan + mêr, hevreh soranî farisî comerd.
- ❖ Xort: Hêz e, di heman demê de di zimanê kevnar ê hurî de, "xor" tê wateya rokê.
- ❖ Di zaravayê soranî û zazakî de ji bo gotina mêr, peya piywa tê bikaranîn. Tê wateya kesên ku li ser pêyan dimeşin.
- ❖ Egîd: Di soranî de "gîd" pezkovî ye. Egîd kesê ku koma xwe diparêze û pêşengîtiyê dike.
- ❖ Cengawer: Ê ku pala xwe dide parastina civakê û taybetiyên wî yên egîdî li pêş in.

Şîroveyek din jî, di zimanê hewramî de ceng daristan e, cengawer jî yê ku daristanê diparêz e.

- ❖ Gernas: Ji ger û nas tê.
- ❖ Xozan: Ji xwe zan tê.

Bi hin zimanên din:

- ❖ Bi erebî recul, tê wateya kesê bihêz.
- ❖ Bi suryanî gebro, tê wateya kesê bihêz.
- ❖ Bi ingilîzî: Man

- Bi fransizî: Homme
- Bi almanî: Mann
- Bi îtalî: Uomo
- Bi spanyolî: Hombre
- Bi ermenî: Mard
- Bi rûsî: Muzhchina
- Bi farisî: Merd
- Bi tirkî: Erkek

Bi giştî di van navan de taybetiyên ger, naskirin, hêz, parastin û comerdî derdikevin holê.

Mêranî û taybetiya mêran piştî şaristaniya desthilatdar derketiye.

Guhertina peyva mêr girêdayî pêşketina hişmendiyê ye.

Rêbaza etîmolojî ji bo me gelek daneyan kom dike.

Ji bo xurtbûna têkiliya di navbera jin û mêr de:

Ji bo pêvajoya avabûna hebûna azadî û nasnameya jinê, jin û mêrên têkoşîna azadiyê fêm dikin û piştgiriyê didin ku divê têkoşîneke piralî û domdar bimeşînin. Her wiha perwerde û jinûve pêşxistina avabûnê, pêwîst in. Divê bawer bikin ku di jiyanê de nasname û xwezaya li ser bingehê dijberî û

serdestiyê ava bûne, ne xwezaya jin û mêr in. Diyalektîka xwezayî ya xwezaya civakî û hevsergihayîkirinê, didin jiyankirin. Ev berî her tiştî, karê xurtiyeke mezin a etîk (zanista Sinc), estetîk û têkoşînê ye.

Xwezaya jin û mêrên ku çanda baviksalariyê ew kirêt û biyanî kirine, divê bawer bin ku xweşikbûn, azadbûn e û xweşikbûn jî bi ked û têkoşîneke mezin tê afirandin. Her wiha divê vê rastiyê ava û mezin bike. Ev yek dê bibe tolhildana herî mezin a ji hişmendiya mêr; hişmendiya ku bi hezarên salan jin mîna "zayendê kole" û mêr jî weke "zayendê serdest" hiştiye. Ji bo vê jî divê em her tim bi bîr bînin ku di dema xwedawendan de jin û mêr hebûnên azad bûn û em jî zarokên wan demên wekheviyê ne.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima biyanîbûn ketiye têkiliya di navbera jin û mêr de?

2. Li derdora ku hûn lê dijîn, têkiliya di navbera jin û mêr de çawa ye?

BEŞA SÊYEM

AZADKIRINA ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ

1. ZAYEND Û ZAYENDPERESTÎ

2. ZAYENDPERESTÎ

3. JIYAN Û ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ (1)

4. JIYAN Û ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ (2)

5. AZADKIRINA ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ

WANE 1

ZAYEND Û ZAYENDPERESTÎ

Berhema mirov a nexwezayî, hişmendiya desthilatdar û ya ku berhema wê xwe dispêre çavkaniya zayendperestiya civakî û sedema wê, ne zayend e.



Her wiha, dê şîrove bike ku çawa zayendperestî hatiye çêkirin û fêrkirin. Herî dawî guftûgoyên azadbûna zayendperestiya civakî, dê çawa bê derbaskirin.

Guftûgoyên zayendperestiya civakî, ne jin li hemberî mêr dike; ev têkoşîn di navbera kesên ji wekhevî û azadiyê bawer dikin û kesên pergala desthilatdariyê dimeşînin de tê berdewamkirin. Pêvajoyên azadiya jin û mêran bi hev ve girêdayî ne. Ji bo ku jin di civakê de çewisandinên baviksalariyê bişkînin, li hemberî desthilatdariyê radiwestin; heta ku mêr jî di heman çarçoveyê de tevgerekê dest pê neke, biserxistina vê yekê, ne gengaz e.

A. Zayend:

Ji zayînên biyolojîk û yên girêdayî fizîka genetic-genetîk (zikmakî-nijadî) ên ku taybetiyên jin û mêr diyar dikin re, **"zayend"** tê gotin.

Taybetiyên zayendê:

1. Zayend xwezayî ye
2. Zayend biyolojîk ye
3. Zayend ji jidayîkbûnê ve, nayê guhertin. Yanî li gorî cih nayê guhertin, li hemû cihan heman e (Bi pêşketina zanistê re li ser zayendiyê jî hin destlêwerdan tên kirin.).

B. Zayendperestiya civakî:

Pênaseya zayendperestiya civakî: Ji ristên cur bi cur ên ku civak dide jin û mêr û ji wan re destnîşan û pênase kiriye re, **"zayendiya civakî"** tê gotin. Zayendperestiya civakî, ne ji ber cudahiya biyolojîk e, ev têgehek girêdayî civakê ye. Civak, jin û mêr çawa dibîne, çawa dinirxîne, çawa dihizire; ango dixwaze jin û mêr çawa tev bigerin. Ev nexweşiya ku di civakê de hatiye çêkirin dikare were guhertin; ji ber ku ne zikmakî ye û mirovan daye çêkirin.

Taybetiyên zayendperestiya civakî:

1. Zayenda civakî bi çand, kevneşopî û hînbûnên civakê re, girêdanan çêdike. Rola jin û mêr di civakê de çi ye, bi van nêrînan tê sazkirin.
2. Zayenda civakî, taybetiyên jin û mêr, helwestên wan, berpirsiyariyên wan û hwd, destnîşan dike.

Mînak: Dema ku mêr dikeve şaştiyan, ji aliyê civakê ve tiştekî normal tê dîtin, lê dema ku jin şaştiyan bike, ji aliyê civakê ve sûcdar tê dîtin.

Têgeha zayendperestiya civakî, weke tevger ji aliyê jinê ve ne mijareke nû ye. Dahûrînên Abdullah Ocalan ên ku li ser jin û malbatê ji 1987'an ve dest pê kiriye, di çareyên civakî de diyar dike ku jin û malbat di nava civakê de weke encama hişmendiya baviksalariya serdest e û bi awayekî nexwezayî bi pêş ketiye.

Jin di nava civakê de bi qasî ku rewşa wê ya duyem hatiye çarekirin, hatiye xuyakirin ku ne pirsgirêkeke biyolojîk e. Girêdana vê hişmendiya civakî, bi hişmendiya desthilatdar ve dibîne. Di perspektîfa xwe ya azadiya zayendperestiya civakî de, di hêza rêxistinî û çalakiyên xwe de, derxistiye holê.

Ya ku ev peyv xistiye nava civaknasiyê nivîskara berîtanyayî **Ann Oakley** (An Oklê) ye. Li gorî wê "zayend" di warê biyolojîk de cudahiya jin û mêr vedike. Zayendperestiya civakî jî cudahiyên di navbera jinîtî û mêraniyê de û di parçebûna aliyên newekhev ên beranberî pêşketina civakî de vedibêje.

Bi gotineke din têgeha zayendperestiya civakî, balê dikişîne ser cudahiyên di navbera jin û mêr de yên ku di nava civakê de hatine çêkirin.

Ann Oakley nivîskareke Brîtaniyayî ye, di beşa piskolojî û civaknasiya jinîtiyê de xebitiye. Di heman demê de ew mamoste û birêveberiya lêkolînên civaknasiya civakî ya Londonê ye.

Mînak: Dema ku kur xwendina xwe diqedîne, asta wî di civakê de bilind dibe. Lê dema ku keç xwendina xwe biqedîne tevî ku serkeftî ye jî, dibêjin: "Çi qas asta te bilind bibe, tu ji bo anîna zarokan û zewacê yî".

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Taybetiyên zayendê çi ne? Bi mînakan rav bike.

2. Pênaseya zayendperestiya civakî çi ye? Binirxîne.

3. Li gorî we zayendperestî bandorê li çi dike?

WANE 2

ZAYENDPERESTÎ

Ramyarê civaknasiya azadiyê Abdullah Ocalan, bi peyîtandina: "Ji derketina hiyerarşiyê ve bîrdoziya desthilatiyê wate li zayendperestiyê bar kiriye." Di heman demê de dibêje: "Jineolojî, dibe ku bibe derketineke bingehîn." **Ji aliyê çareya diyalektîk û dijîtiya diyalektîk ve, mirov çawa dikare van her du derketinan, bigire dest?**

Derketina yekem: Ev pênc hezar sal e, ji hemû desthilatiyan re bûye xala derketinê. Bîrdoziyek e ku jin bi her alî ve aniye ber deriyê tunekirinê.

Derketina duyem: Derketinek e ku soz û biryara lêkolîna tevahî xirabiyên vê bîrdoziyê dide. Li hemberî van xirabiyan azadî, aştî, hezkirin, dadwerî, xweşikî û avakirina cîhana jinê ya ku xwe dispêre gelek nirxan, armanc digire.

Bîrdoziya zayendperestî, gelek mafan dide mêr; di nav de mafê kuştina jinê jî rewa dibîne.

Li gorî mêr, jin bêaqil, bêhêz û jinik e (biçûkxistin) û ya ku her û her divê desthilatdarî li ser bê meşandin. Bireser (kar li ser tê kirin) û amûrek e; ya rast ne tiştek e. Heger wateyeke wê hebe, di çarçoveya desthilatdariya hişmendiya mêr de ye; ji hebûn û xwebûnê wateyeke wê tune ye.

Di rastiya civaknasiya cîhanî de, jin bi wan mêran re dijîn ku mafên wan bêsînor in û her roj bêmafiyê li jinan dikin. Wê demê, jin dikarin qala kîjan azadî û jiyankirina kîjan nirxên jinîtiyê bikin?

Di rastiya têkiliyên ku piraniya wan destdirêjî, destavêtin, êrîşkirin û bêrêzî ne, jin dê hezkirin û evînê li ku derê û çawa bi cih bikin? Bi rastî jî şoreşeke jinê ya ku vê rastiyê lê bisepînin, tune ye? Lê bersiva jineolojiyê, heye!

Jineolojî ji bo zayendperestiya civakî bi berfirehî bê dahûrandin, derbaskirin û rakirina ji holê, dixebite.

Di vê demê de tevî ku di tu qonaxa dîrokê de çênebûye, jin bi piralî weke amûra kedxwariyê tê bikaranîn. Bi hezarên salan jin bi bîrdozî tê tunekirin. Di roja îro de ji aliyê biyolojîk ve û bi awayekî bipergal tê tunekirin. Hebûneke ku were bênirxkirin, bi awayekî xwezayî, tu wateya berdewamkirina hebûna wê namîne. Jineolojî dê ji bo hebûn û heyîna jinê, li hemberî tunekirin, bîrdoziya zayendperest û tunekirina biyolojîkê, raweste.

Tunekirin bi rêya bîrdoziyê mîna pêvajoyeke encama bîrdoziya zayendperestiyê, hat xebitandin û bipêşxistin. Ev tunekirina bîrdozî, yek ji mezintirîn tawanên mirovahiyê ye ku li hemberî jinê hatiye kirin. Dîroka wê pênc hezar sal dewam kiriye. Di afirandina vê tawanê de, bi piştgiriya hev û li pey hev; efsane, ol, felsefe û zanist hatin bikaranîn. Tevahî mirovahiyê jî, kirin hevbeşê vê tawanê. Di hişê tevahî mirovahiyê de piraniya jinan jî tê de, gelek bawerî û hizirên şaş çêkirin. Mîna ku jin, lawaz, zayenda duyem, heta ne mirov e jî, ji zayînê ve gunehkar e. Her tim divê bi tundî û çewisandinê re were perwerdekirin. Ev yek di heman demê de tawaneke sincî û wijdanî ye ku mirov dixapîne.

Jin dikare xwe, bi hemû nirxên etîk û estetîkê yên xwedawendiyê bipêçe û wan rojaneyî bike. Jin dikarin bi rêxistinkirina hêza baweriyê ya di dilê jinên ku bêberjewendî kar û bawer dikin de, pêk bînin. Li hemberî hişmendiya desthilatdar a zayendperest, felsefeya yewnanî a ku dibêje: "Jin mêrekî ku kêm hatiye afirandin". Vê bîrdoziyê serweriya xwe li ser hişmendiya Rojavayê û cîhanê kiriye. Li hemberî vê bîrdoziyê jin dikare bi bawerî, wêrekî, nazikî û aqilê **Hypatiayê** xwe bixemilîne û çareyê bibîne.

Hypatia: Fîlozofa ku di beşa felsefeya platonî ya nûjen de xebitiye. Ew jina yekem e ku navê wê di dîrokê de weke zanyara bîrkariyê, pispora perwerdekirina felsefe û zanista stêrnasiyê, dihat naskirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Gotina Hypatia: "Mafê xwe yê hizrandinê biparêze, heger hizirandina şaş be jî, baştir e ku tu bi carekê re nehizirî." Şîrove bikin.

2. Gelo jiyan bi reng û aliyekî tenê xweş e, yan na û çima?



Li Ewropayê nûjeniya kapîtalîst piştgiriya zayendperestiya civakî dikir; keda jinê biçûk didît û dixwar.

WANE 3

JIYAN Û ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ

(1)

Hişmendî û nêzîkatiyên ku çavkaniya zayendperestiya civakî bi biyolojiya jinê ve girê didin, di roja me ya îro de jî ne kêm in.

Xapandinên ku hişmendiya desthilatdar bi zanabûn bi kar tîne û zêde kiriye, beşên ku bi vê dane bawerkirin jî hene. Heta jin jî, bi vê xapandinê dane bawerkirin. Hinek derdorên femînîst, zarokanîna jinê û dayîktiyê, li pêşiya jinê weke asteng dîtine. Bêdadiyên di rist û berpirsiyariyên civakî de bi wê ve girê dane. Ji ber vê yekê, bi bergirtina çêkirî ve nirxandin û projeyên weke zarokanîna mêr, nedîtina çavkaniya pirsgirêkê ye û ji hişmendiya desthilat a mêr re, xizmet kirine. Weke biyolojîk û genetîk, du cureyên zayendan hene û ew ji hev cuda ne. Ev cudahî, dewlemendiyên jiyanê ne û nabin sedem ku jin bên lawazxistin. Lê belê ol, bîrdoziyên hişmendiya desthilatdar ên mêr û çanda ku wan afirandiye, rewşa jinê ya bûyîna zayenda duyem bi kar tînin, an jî rewa dikin û didin bawerkirin. Lê ya ku jinê lawaz dike û dike statûya zayenda duyem, çanda desthilatdar a civakî ye.

Newal Elsadawî: (Bijîşka nexweşiyên sing û piskolojiyê ye. Nivîskar û romannivîsa Misrî û parêzera mafên mirovan bi giştî û bi taybetî mafê jinan e. Lê ji ber ku hizira wê ne ya Rojhilata Navîn e, ji aliyê civakê ve tê rexnekirin.)

Newal dibêje:

Serkeftina jinê di civakê de, tê wateya serkeftina wê di şûştina firaxan, dirûtina goran, çêkirina xwarinê… de û çawa li hevjînê xwe baldar be. Serkeftina hizirî, jêhatîbûn û jîrikiya jina gihayî, hemû jê re wekî kêmanî tên dîtin. Jin, wê demê çawa jîrikî û jêhatîbûna mejiyê xwe xurt bike?! Jîrikiya jinê, mêraniya mêr kêm dike. Ji bo ku jin karibe parastina mala xwe bike, pêwîst e jîrikiyên xwe veşêre.

Weke biyolojîk, em li rastiyên ku van her du zayendan ji hev cuda dikin, binêrin. Gelo di rastiyê de têkiliyeke wê bi erka ku hatiye dayîn re heye? Weke biyolojîk, tişta ku van her du zayendan ji hev cuda dike, pergala bergirtinê (zarokanînê) ye, zarokanîna jinê, malzarok û tiştên weke van in. Niha ji ber ku jin zarokan tîne, gelo baş karê malê dike, baş zarokan xwedî dike, baş xwarinê çêdike, yan jî karên ku weke karên jinê tên zanîn, baş dike? Lê heger jin dikare xwarinê çêke, mêr jî dikare çêke. Li pêşiya nekirina wî, tu astengiyên biyolojîk nînin. Ji bo ku mêr baş xwarinê çêke, pêwîstiya wî bi malzarokekê jî tune ye.

Her wiha, jin zarokan tîne, ma em bibêjin ji ber ku mêr zarokan nayîne, nikare li zarokan baldar be?

Eger mêr bixwaze û çanda civakî jî jê re nebe asteng û nebêje şerm e, risteke wisa jê re bê dayîn, pir baş dikare li zarokan jî baldar be. Dikare karê malê jî bike, astengiyeke biyolojîk ji vê re tune ye. Qada raya giştî jî, ji jinê re girtî ye. Wekheviya derfetan tune ye. Ji ber vê, di gelek

civakan de rêjeya xwendinê ya jinan pir kêm e û li paş e. Ji ber vê sedemê di aborî, zanistî, ramyarî û birêvebirinê de, bi kurtasî di qada raya giştî de jin pir kêm in. Ev derfet ji bo her du zayendan di heman rêjeyê de nayên dayîn. Gelo ji ber ku jin di qada raya giştî de nikare kar bike, **çima ji derveyî malê tu rêyên din nayên hiştin?** Gelekî vekirî ye ku ev ne rast e.

Tam berovajî vê, heger îro mirovahî di vê rewşê de be, ev rewşek e ku girêdana xwe bi bandora hişmendiya desthilatdar a mêr a li ser aborî, ramyarî, zanist û gelek qadên din, serdestbûna wê heye. Îro ji bo demokratbûna ramyariyê û çarebûna gelek pirsgirêkên civakî, em qala şêweyê lênêrîna jin û tevlîbûna wê dikin. Ji ber vê yekê, bîrdozî û paradîgmaya (nimûne) di çarçoveya jinê de, girîng e.

Ango bi kurtasî, weke encam: Rist û berpirsiyariyên zayendperestiya civakî yên ku spartine jinê, nexwezayî ne. Encameke nêzikatiyên bîrdozî yên hişmendiya mêrê desthilatdar e û ne gengaz e ku biyolojîk be.

Her wiha, di encama zayendperestiya civakî de, xwezaya zindî jî nîşanî me dide ku statûya duyem a jinê û ristên hatine dayîn, ne rewşeke ku bi biyolojiyê ve girêdayî ye.

Clare Boothe Nivîskar, rojnemevan, siyasetmedar û yekem doblomasiya Amerîkayî ye.

Clare Boothe (Klara Bos) dibêje: Ji ber ez jin im, ji bo ku ez bi ser bikevim divê ez kedeke pir mezin bidim; lê heger ez bi ser nekevim kes nabêje ku ez bi ser neketime, dê bibêjin ku hemû jin nikarin bi ser bikevin.

Di xwezayê de zindiyên nêr û mê hene. Di şînatî û lawiran de jî hene. Ev yek di xwezayê de dewlemendiyeke jiyana zindiyan pêk tîne. Tevî vê, di xwezayê de statûyeke wisa tune ye. Di mirov de çêbûna statûyê ku beş û encama xwezayî ye, di xwezayê de jî rewşeke gelek berovajî vedibêje.

Zayendên civakî, dikarin bên guhertin û veguhertin. Ev yek nîşan dide ku ristên jin û mêr tên guhertin. Her tim ne di rewşeke mayînde û guherbar de ye; li her cihî ne heman e, civakî ye, çandî ye… li gorî pêvajoyan jî, tê guhertin.

Mînak: Zayendperestiya civakî ya di serdema navîn-feodal û ya di roja me de ne heman in. Rist û erkên li jin û mêr tên barkirin, dikarin bên guhertin.

Berpirsiyarî yan jî ristên jinên li Ewropayê û jinên li Rojhilata Navîn û Kurdistanê, ne heman in. Lê belê li ku dera cîhanê dibe bila bibe, nêzikatiyên zayendperestiya civakî hene. Hişmendiya desthilatdar a mêr xwe zirav jî bike, jiyana xwe bixe nava qalikan jî, naveroka wê nayê guhertin û her zayendperestî ye.

Ya bingehîn ji bo derbaskirina civaka zayendperest, bi têkoşîna azadîxwaz a li dijî hişmendiya desthilatdar a mêr e.

Çawa ku di xwezayê de nêr û mê hene, pêwîst e di jiyana me de jî jin û mêr wekhev bin. Serweriya tu kesî (jin an mêr) li ser yê din tune ye, yanî jiyaneke dualîte û pirrengî, jiyana herî rast e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hin mînakên civakî yên ku tê de cudahî di navbera jin û mêr de hene, binivîse.

2. Tê gotin: "Heger tu bixwazî civakekê kole bikî, destpêkê jina wê civakê kole bike", çima? Weke girûpekê lêkolîn bikin.

WANE 4

JIYAN Û ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ

(2)

a- Zayend çawa dibe civakî û tê fêrkirin:

Divê hinekî li ser vê mijarê bê rawestandin. Ji pêvajoya zarokên keç û kur bigire, heta hatina rewşa jin û mêr, em dibêjin civakîbûn. Lê zarok zelal û paqij in û aşopiyên wan nehatine qirêjkirin; di aşopiyên wan de wekhevî û azadîxwazî heye. Em ji pêvajoyên civakîbûna xwe re dibêjin: Pêvajoyên ku me "xinizî" li aşopiyên xwe kirine.

Gotineke ramyarê civaknasiya azadiyê Abdullah Ocalan heye, dibêje: "Min xinizî li aşopiyên xwe yên zarokatiyê nekir."

Ji bo mirov xiniziyê li aşopiyên xwe yên zarokatiyê neke, divê li hemberî pergala zayendperestiya civakî di nava têkoşîneke mezin a azadîxwaz de be.

Pêvajoya civakîbûna zarokê, di vê pêvajoyê de zarok tê fêrkirin ku dê çawa bibe beşek ji malbata ku tê de ji dayik bûye û taybetiyên derdorê bigire. Ji vê pêvajoyê re **"civakîbûn"** tê gotin.

b- Fêrkirina zayendperestiya civakî, ji çar pêvajoyan pêk tê:

1. Şêwedayîn (Manîpulasyon)
2. Arastekirin (Beralîkirin)
3. Pênaseyên şêwaz û hunera axaftinê
4. Nîşandana (teşhîr) bandorbûnê

1- Şêwedayîn (Manîpulasyon):

Şêwedayîn, arastekirin û berovajîkirina erk û ristên ku li mêr û jinê bi zanebûn hatine barkirin, raber dike. Bêyî ku rastiyeke xwezayî ya dayîk û bav be, ji aliyê kesên mezin ve di armanca vê çarçoveyê de şêwedayîn û berovajîkirina rastiyê ye.

Li vir armanc çi ye? Di çarçoveya pîvanên ku zayendperestiya civakî diyar kiriye de amadekirina zarokên keç û kur e. Ji roja ku zarok dest bi fêmkirinê dike, li gorî armancên xwe amadekirin, an jî berovajîkirina rastiyê heye. Di salên ku zarok dest bi axaftinê dikin de, ji bo ku zarok her tiştî fêr bibe, daxwazeke hêzdar heye. Zarokên ku ji dayîk, bav û mezinên xwe pirsan dikin, ji ber ku nikarin bersivên wan bidin weke xapandinê tê naskirin. Dema ku em bi zarokekê/î re dikevin peywendiyê, em çi qasî wê/î dixapînin?

Sedemên xapandinan jî ev in: Bav yan jî dayîk dixwazin hin rastiyan ji zarokan veşêrin, di encamê de zarok tên xapandin û wisa mezin dibin. Divê heta astekê li gorî mejiyê zarokan, rastî werin gotin. Li cem zarokan hemû tiştên ku dayîk û bav dibêjin, rast in. Divê tu carî zarok dûrî vê baweriyê nemînin, bi xapandinê re rû bi rû nemînin.

2- Arastekirin:

Bala zarokên keç û kur û têkiliya wan a kêşana ser heyberan, zayendiya civakî diyar dike, an jî taybetiyên wan heyberan digire nava xwe. Ev

arastekirin, hîn di temenê zarokatiyê de dest pê dike û di hemû warên jiyanê de li dibistan, cihê kar û gelek deveran, xwe nîşan dide. Pêlîstokên ku di temenê zarokatiyê de ji wan re tên hilbijartin, di diyarkirina pêşeroja ristên wan ên civakî û kesayetiya wan de girîng e. Ji zarokên keç re bebik û bûk û ji zarokên kur re jî erebe, demançe û balafir tên kirîn. Zaroka ku bebikê digire, di lîstokan de bi rista dayîkê radibe û xwe ji dayikbûnê re amade dike. Zarokê ku bi balafirê bilîze, aşopiya wî ew e ku bibe pîlotek. Zarokê ku bi çekê bilîze dibe ku bibe leşkerek. Heta li gelek welatên hejar, şensekî zarokan ê ku bi van lîstokan bilîzin jî tune ye. Di temenê zarokatiyê de, yekser di nava jiyana rastiya civakî de, van ristan didin zarokan.

Zarokên keç ên ku hîn di temenê dibistan û lîstinê de ne, berê wan nadin dibistanê û weke jinên biçûk (dayîk) li xwişk û birayên xwe baldar in û karê malê dikin. Neçar in ku alîkariyê bidin dayîka xwe.

Zarokên kur ên biçûk jî, weke mêrê mezin neçar in ku bixebitin û debara malbata xwe bikin û alîkariya bavê xwe bikin. Hîn di temenekî biçûk de dikevin bin bar û berpirsiyariya giran. Di bin vê berpirsiyariyê de difetisin. Lê belê dema ku tên malê, êdî weke bavê xwe mêr in. Xwişkên wan, heta yên mezin an jî dayîka wan, divê cudabûn û statûya wan a ku bûne mêr zanibin. Li xwişkên xwe dixin, ji tevger, perwerde û namûsa wan, berpirsiyar in. Pergal ji zarokatiyê ve

dest pê dike, li gorî berjewendiyên xwe teşe dide daxwaz û aşopiyên zarokan.

3- Pênaseyên şêwaz û hunera axaftinê:

Şêwaz û hunera axaftina malabatê bi zarokên kur û keç re ji hev cuda ye. Dema ku ji zarokên kur re dibêje: "Kurê min bi hêz e, şêr e", bêyî ku zanibe ew di kîjan xalê de bihêz e, bi hêzbûna xwe bawer dike. Aşopî, lêgerîn û çalakiyên kurê hêzdar, bi pêş dikevin. Tê digihîje ku bihêzbûn ji bo mêrekî, pîvana erêkirin û pejirandinê ye.

Dema ku ji bo zarokên keç dibêje: "Keça min weke xezalekê ye, ji gotina min dernakeve û keça min xweşik e, bi axaftinên bi vî awayî re zaroka keç dizane dê çawa bê erêkirin, pîvanên erêkirin û pejirandinê, derneketina ji gotinên dayîk û bav û xweşikbûn e.

4. Nîşaneyên bandorbûnê:

Di zaroka keç de hîn di zarokatiyê de serîtewandin, rêzgirtin, belengazî û kêmxistin, kesayetiyeke lawaz û girêdayî, tê bipêşxistin.

Di zarokê kur de jî, kesayeteke bixwebawer, bihêz û serbixwe, tê bipêşxistin.

Mînak: Di dibistanên dewletan de hişmendiya ferq û cudahiyê derdikeve holê; di kesayeta kuran de xwendevanî û di keçan de bermalî (çêkirina xwarinê, şûştin, malaştin...) tên bipêşxistin.

Divê ku ev ferq û cudahî dernekevin holê; ji ber ku xwendin û nivîsandin ji mafê her du zayendan e. Dema ku cudahî hebe dê hevsengiya xwezayê xirab bibe.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima divê cudahî nekeve di navbera keç û kuran de?

2. Bandora malbatê di perwerdekirina zarokan de çi ye?

WANE 5

AZADKIRINA ZAYENDPERESTIYA CIVAKÎ

Pergala serwer, cudahiyên xwezayî yên mirovan wergerî zayendperestiya civakî kiriye. Bi tevlîbûna ji civakê re kesayetên nû yên zayendan afirandine. Ev awayê tevlîbûnê, kesayetên di nava civakê de, nûjenên tevgerkirinê, ristên wan, berpirsiyariyên wan, çawaniya wan, maf û karên wan, veguhertine jin û mêrên ji hev cuda. Ji arastekirina ber bi amûrên lîstokên zaroktiyê ve dest pê dike, bi bang û danasînên gotinî ku mêr li ser jinê serweriyê bikin, tên sergihayîkirin. Ji wir û şûn de têkiliyên di navbera jin û mêr de ji aliyê zayendperestiya civakî ve tên diyarkirin.

Li jêr axaftina Cloudia Von Werlhof (Klawdya wêrl-hof) a ku pergala baviksalarî çawa şêwe dide zayendan, bi awayekî vekirî datîne holê û dibêje:

"Di dîrokê de cudahiya xwezayî ya di navbera zayendan de ku sazûmaniyên civakî yên hatine avakirin, bi qasî ya di roja me de hov û bi awayekî pergalî nehatine bikar-anîn, bilindkirin û çewtkirin. Vê rêxistinê, di destpêkê de zayen-diya xwezayî ku werdigerîne civakeke zayendî, mêraniya çê-bûyî; kiriye "mêr" jinê jî kiriye "jin". Di rastiyê de mêranî veguheriye nijada mirov û jin jî veguherandiye zayendiyê. Di



Cloudia Von Werlhof yekemîn jina lêkolîner û mamosteya jinîtiyê li Awis-turyayê, zanyara civaknasî û zanistên ramyarî ye.

encamê de ji bo ku ev rêxistin karibin jin û mêran weke aboriyê dagir bikin, dubare cudahiyên ku wê xwe bi xwe daye avakirin, "xwezayî" radigihîne.

Zayendperestiya civakî, bîrdoziyeke wisa ye ku jin di hemû qadên jiyanê yên mîna: aborî, ramyarî, civakî û hwd de, daye girêdan.

Mînak: Di şaristaniya Romayê de, jin ji bo kêfxweşiya mêr e, amûreke erzan e û mêr dikare li gorî kêfa xwe nêzî wê bibe. Mêr heta diravên jinê digirtin cem xwe; ji ber ku jin di nêrîna mêr û civakê de kole bû. Ev jî dihat wateya ku tu nirxê wê tune ye; jiyan û mirina wê, di destê bav û hevjînê wê de ye.

- Bîrdoziyeke ku desthilatdariya mêr mezin dike û jinê biçûk dike. Di heman demê de, dibe xwediyê wê jina ku hatiye biçûkxistin û hestên mêr ên mewdaniyê têr dike.
- Bi rêya zayendperestiya civakî, jinê dikin weke heybera desthilatdariyê û dibin mijara bingehîn a mewdaniyê ku bingehê desthilatdariyê ye.
- Di roja me de girêdana zayendperestiya civakî ya bi desthilatdariyê re jî diyar dike ku çi qas xwezaya mirov bi vê re hatiye bikaranîn û mêtinehkirin.
- Mêrê ku çavên xwe berdaye desthilatdariyê zêdetir berê wî li mêrbûnê ye. Mêr dê rewşa xwe ya ku li hemberî jinê heye, biparêze û ew desthilatdariya ku çêbûye jî dê li ser tunekirina jin û jinbûnê ava bike.
- Piştî ku zayendperestiya civakî, weke bîrdozî hatiye rêxistinkirin û şûn de bi şêweyekî berfireh bi endamên civakê dan pejirandin, bi demê re dikeve rewşa çandekê. Ji vî alî ve, bi dayîkbûna endamên civakê re perwerdekirina zayend-perestiya civakî hatiye avakirin.
- Desthilatdariya ku li ser jinê hatiye kirin, ji aliyekî ve zêdebûna zayenda jinê dixe bin berbendiyê (kontrol) û

ji aliyê din ve jî pêkhateya mêrên ku xwediyên jinê; bav, bira, bi awayekî giştî ya ku jê re beşa mêr tê gotin, dixin bin desthilatdariya xwe.

- Mêr bi vê rêyê tên çavdêrîkirin û bi vê dikevin nava bikaranîna rewşa pergala zayendperestiya civakî. Ev pergala ku hatiye çêkirin, dixin nava rewşeke pîroz.
- Bi dek û xapandinan civakê bi pîroziya nûbûnan didin bawerkirin. Di nava demê de, ev weke rastiya tekez a ku nayê derbaskirin, tê destgirtin û hîmê desthilatdariyê pêk tîne.
- Ya piştî vê jî, ji bo ku desthilatdariyê domdar bikin û serkariya (taşerontî) koletiya jinê berdewam bikin, çanda şer bi pêş dixin û fêrkirina civakê ya ji bo vê, pêk tînin. Ji bo ku tevahî civak fêrî vê bibe, divê jin fêrî koletiya xwe, jinbûna xwe ya ku weke mewdaniyê lê hatiye kirin û desthilatdariya mêr a rizî, bibe. Dema ku ji qada desthilatdariya biçûk, avahiya desthilatdariya mezin tê çêkirin; kesayeta mêr di bin vî barî û mezaxa vê desthilatdariyê de, bi tevahî ji cewherê xwe derdikeve û ji kesayeta xwe, biyanî dibe. Mêraniya ku di armanca azadbûnê de ye, pêwîst e hişmendiya mêr a desthilatdar çare bike. Pêwîst e destlêwerdana rewşên xwe yên hene, bikin. Divê karibin dest ji xapandinên ku desthilatdarî pêşkêşî wan dike, berdin. Divê ew hîmên ku sîbera sexte ya ku desthilatdariyê li ser lingan dihêlin, bişkînin. Heger ev çênebe, azadiya mêr tenê wê di gotinê de bimîne.
- Ev armanca wan a ku ji bo bi jinê re bi azadî bijîn, ji gotinê wêdetir naçe. Em ê nikaribin dabaşa civakeke azad û hevjiyana azad (jin û mêr) bikin. Civaka azad bi awayekî azad di jiyankirina her du zayendan re derbas dibe. Afirandina erkê herî bingehîn ê azadkirina

jin û mêr jî ev e: Derbaskirina hişmendiya desthilatdariya mêr a ku zayendperestiya civakî, ava kiriye.

Mînak: Şaştiyên jinê mîna şaştiyên mêr in, ji ber ku şaşîtiyên jinê yên ku neyên bexşandin (efû) tune ye û şaşîtiyên mêr yîn ku werin bexşandin tune ye. Ji ber vê yekê, pêwîst e civak cudahiyê nexe navbera jin û mêr.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Zayendperestiya civakî li ser jiyana jinê, çawa bandorê dike?

2. Azadkirina zayendperestiya civakî dê çi bandorê li pêşxistina civakî bike?

BEŞA ÇAREM

NASNAMEYA JINÊ YA CIVAKÎ

1. JINEOLOJÎ Û ÇANDA DAYÎKÊ
2. ÇAVKANIYÊN JINEOLOJÎ
3. JINEOLOJÎ Û ŞOREŞA JINÊ

WANE 1

JINEOLOJÎ Û ÇANDA DAYÎKÊ

Berî hezarên salan, dapîrên me di mercên herî zehmet de, şoreşa gund a ku mohra xwe li şoreşa hebûn û jiyana mirovahiyê xistiye, bi ewle kirine û bi ser xistine. Neviyên wan jî bi derfetên mezin, jineolojiyê bi pêş dixin. Hişê xwe, giyanê xwe, hest û hêza hizirî, mirovahiya xwe, jinîtiya xwe, li ser kokên xwe ji nû ve şîn dikin. Jiyanên di çarçoveya jinê de ji Rojhilata Navîn derketine. Hizira jineolojiyê heger ji vê axê derketibe, dibe ku bi van kokan re girêdayî be. Jinan li ser van axên kevnar, tevahî tiştên pêşî yên erênî jiyane û dane jiyankirin. Bêşensiyek jî heye ku ev ax, di heman demê de bûne axên ku li ser hemû tiştên neyînî jî bi jinan dane jiyankirin. Jinan li Rojhilata Navîn civakîbûn bi kedeke mezin afirandiye. Heger îro jin, li dijî hizira zayendperestiya civakî bi awayekî zanistî guftûgo bikin; ev hêza civakîbûna jinê ya ku li ser van axan dijî, tekez dike.

Ji ber ku di gelek qadên jiyanê de keda jinê, jîrekî û afirîneriya wê xurt bû, jinê gelek nirxên heyberî (çandinî, çêkirina kûzan, lêkirina xaniyan û hwd) û rewanî (wekhevî,

sinc, rastî, hezkirin û hwd) afirand û kom kir. Jinan li ser vê danhevê teknîk, zanist, wêje, huner, ol, ziman û hizira neolîtîkê afirandin û bi pêş xistin. Ji bo her kêlî û ji bo pêwîstiyên jiyanê, şoreş mîna çareyê didîtin. Bi hizir û vîna jinê, zehmetiyên ku hebûna civakê dixistin tengasî û zorê, derbas kirin. Li Rojhilata Navîn jiyana civakî bi taybetiyên xwe (sincî û polîtîk) kok berda, bi pêş ket û berfireh bû.

Di efsaneya Sumeran de dabaşa **104 Me**'yên Înannayê tê kirin, ew tevahî zanist û teknolojiya dema neolîtîkê raber dikin. Ew çand, huner û felsefeya wê ye; amûrên şaristaniyê yên ku hatine afirandin, bi zanyarî û gelek taybetiyên dayîka xwedawend a bihêz hatine afirandin.

Di roja me de jineolojî dê bibe zanisteke ku bihêle hemû zanyariya jinan, ji nû ve bê zindîkirin. Ev zanist, weke gihandina zanista zanyariyên Rojhilata Navîn ên xwedawendên ku hatine nûkirin dê bi pêş bikeve. Ji saziya civakî bigire heta rêzik, teknîk û hunerê; ji bo 104 **Me**'yên (nirxên jinê ên ku hatine vedîtin) ku di her qada jiyanê de, hatine vedîtin.

Xwedawend Înana

xwedawneda hezkirin û cengê ye. Ew xwedawend a herî mezin li cem Sumeran e. Ûrûk bajarê wê yê pîroz e.

Rojhilata Navîn, çawa ku bûye cih û warê destpêkê yê ku çanda xwedawendiyê lê hatiye afirandin, li ser bingehê mandelekirin (înkar), tunekirin-kuştin û biyanîkirinê bûye cihê ku destpêkê ev çand lê hatiye hilweşandin. Mirov dikare bibêje

ev hilweşandin, rê li ber pirsgirêka civakî ya destpêkê; pirsgirêka jinê vekiriye.

Jineolojî, ji pirsgirêka civakî ya yekem re li çareyan digere û di wê angaştê (îdîayê) de ye ku vê çareyê bi pêş bixe. Ji bo vê yekê, dahûrandinên (analîz) zanistî dê hemû bûyerên der barê jinê de, pirsgirêkên li ser têkiliyên jin û mêr, bersivên bingehîn ên azadî û wekheviyê, jinîtî û mêraniya ku hatiye avakirin, hişmendiyên zayendperest ên qabe û kevneşop, bike. Jinolojî dê hebûnên jin û mêr ên mirovî, bi azadbûna wan re bide nasîn û li rê û rêbazan bigere û bibîne.

Nirxandina peyva dayîkê:

- **Bi zimanê kurdî: Da-yîk:**Ya ku dide. **Cî-yamin:** Cih û warê min.
- Erebî: Um
- Suryanî: Êmo
- Ingilîzî: Mother
- Firansizî: Mêre, mama
- Holendî: Mataka
- Rûsî: Matî
- Yûnanî: Mata
- Spanyolî: Madre
- Tirkî: Anne
- **Ma-ma:** Gotina ku destpêkê zarok bi kar tînin. Ev gotin di heman demê de ji bo xwarinê jî tê bikaranîn. Di gelek zimanan de ji dayîkê re mama, mam, mother û mader jî tê gotin. "Ma" di heman demê de xwedawenda bajarê **Kapadokyayê** ye.

RONÎKIRIN

Kapadokya: Navekî dîrokî ye li herêmekê li Asyaya Biçûk e, (Tirkiyaya niha) îro dikeve herêma Nûşherê.

Destar: Yek ji teknîkên ku jinê bi destên xwe afirandiye.

SEMBOLÊN XWEDAWENDIYÊ

Sembolên ku li ser laşê jinê hatine nexşandin ên weke: rok, heyv, simbila genim, stêrk û hwd. Ew şîroveya zanista xwedawendan e û xweşikbûn û girêdana jinê bi xwezayê re ne.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çand, tê çi wateyê?

2. Gelo di roja me ya îro de, belge û tiştên ku çanda jinê diyar bikin, hene? Çend mînakan binivîse.

3. Bi hevalên xwe re lêkolînekê li ser 104 Me'yên Înanayê bike.

WANE 2

ÇAVKANIYÊN JINEOLOJIIYÊ

Di derketina jineolojiyê de gelek çavkaniyên bingehîn hene. Hemû zanist dê di bin banê jineolojiyê de bi pêş bikevin. Jinolojî, dê her yek ji van çavkaniyan cuda bigire dest û binirxîne.

❖ Çavkaniya yekem: Çanda dayîka xwedawend a erdnîgariya ku em li ser dijîn.

❖ Çavkaniya duyem: Piştî her cara ku pergala dayîkê hatiye hilweşandin, gelek jinên berxwedêr ku bi awayekî birêxistinkirî û takekesî têkoşîn meşandine, derketine holê. Di dîroka nêzîk de jî mîna tevgerên femînîst, jinên berxwedêr û gerîlayên ku di têkoşîna rizgariya netewî de cih digirin, hene. Nasname û rêxistinên jinên ku di tevgerên dijber (muxalif) ên civakî de cih digirin, hemû nirxên azadî û berxwedanê yên jinên cîhanê afirandine.

Bingehekî din ê girîng ku jineolojî li ser bi pêş ketiye, hêz daye û jê hêz girtiye, Şoreşa Azadiya Kurdistanê ye ku hîn ji destpêkê ve di rengê şoreşa jinê de pêk hatiye. Zanistên jinê

ji aliyê kokên dîrokî ve li ser vê erdnîgariyê bi pêş ketine. Di dîroka nêzîk a şoreşa Kurdistanê de, şoreşên jinê weke di nava şoreşê de, şoreş û qonaxên pêşketina tevgera jinê hatine jiyankirin.

JINEOLOJÎ:

❖ Li hemberî tevahî bîrdozî û zanînên desthilatiyê ku li ser zayendperestiya civakî bi pêş dikevin, dema ku derketinekê derdibire: Ya ku herî zêde di zehmetiyan re derbas bûye, "**hebûna jinê**" ye.

Kî dikare ji wan jinên ku ji aliyê xizmên xwe yên nêz ve tên kuştin, destdirêjî li wan tê kirin, çeteyên herî bi rêxistinkirî ên pergala nûjeniya kapîtalîst wan direvînin û li bazarên koleyan difiroşin, li kuçeyan bi destdirêjiya pratîk û gotinan re rû bi rû dimînin, li kargehan hêza kar a erzan in, li malê keda wan tê xwarin, li hember van kiryaran raweste? Jinên li zindanan û li qadan li ber xwe didin, li hemberî zehmetiyên herî dijwar radiwestin.

Zanîna têkiliya di navbera jin û mêr de pir girîng e. Heta têkiliyên di navbera jin û mêr de neyên têgihaştin, pirsgirêkên civakê jî nayên dahûrandin û têgihaştin.

Ji bo vê pirsgirêka di dil û mejiyê pirsgirêkên civakî de, koşa ku serî digire, çare bike, divê mirov bi nêzîkatiyên zanistî, felsefî, etîk û estetîkê bingeh bigire. Mirov di dîroka şaristaniyê û çaxê modern de jin kirine rewşeke çawa nizanibe, hêza nêzîkatiya etîk û estetîkê nîşan nede, her jiyana bêjiyankirin wê bi şaştî, bêsincî û kirêtiyê bi encam bibe.

❖ Tevahiya van pêvajoyên şoreşê ji xwe re dike bingeh û bi pêş dikeve. Felsefeya xwe ya zanînê, bi nirx û danhevên encama van pêvajoyan, diafirîne. Mîna jinên di bin mercên giran ên şer de, di her qadên jiyanê de serboriyên dewlemend kom kirine. Ji serpêhatiya wan têkoşînan, derdikeve û

dadiwerive. Mîna zanisteke civakî ku dê karibe ji sazîbûna jinê re bibe piştevan, bi pêş bikeve.



❖ Bi armanca ku dê dînamîkên civakî derxîne holê û li ser giyanê demê bandor bike, radibe. Bêyî ku civakê dabeş bike, armanc dike ku bi hişmendiyeke şoreşger a di xizmeta dînamîkên xwe de, tev bigere. Jinolojî di wê baweriyê de ye ku jin, di avaniya civakeke wisa de dê çi bikin, bibin çi, çawa bijîn, der barê van de ew ê karibin bi azadî biryar bigirin? Di tevahiya dîroka têkoşîna jinên hemû beşên civakê de, nirxên bêhempa kom bûne. Serboriyên wan, serpêhatiyên wan, xitimandinên wan û dînamîkên pêşketina wan ên gengaz, hene. Ji bo pêşketina civakeke azad û kesên azad, jineolojî bi nêrîn û jîrekiya jinê, ji nû ve şîrovekirinên wan armanc digire. Gencîneyên jinîtiyê yên mezin ku di vê qadê de kom bûne, tevlî giyanê sedsala 21'ê kirine. Her wiha dê karibe gavên mezin bi şoreşa jinê bavêjin. Jineolojî li ser van berxwedan, danhev û hewldanan bi pêş ketiye. Divê ji kêliya ku tê de ye dest pê bike û wate bide jiyanê, zanistê çêke û çareyên bingehîn biafirîne.

Ramyarê civaknasiya azadiyê Abdullah Ocalan dibêje: "Ez dizanim pêşeroj ji niha ve derbas dibe, yên ku niha danehûrînin û çare nekin, ez bawer nakim pêşeroja wan hebe." Divê mirov vê baweriyê di dilê xwe de bigire û bi pêş bixe. Heger karibe bandorekê li ser her qad û her kêliyê bike, jineolojî dikare bibe gava derketinekê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çavkaniyên bingehîn ên jineolojiyê, çi ne?

2. Bi çarekirina pirsgirêka jinê re, gelo dê pirsgirêkên civakê jî çare bibin û çima?

WANE 3

JINEOLOJÎ Û ŞOREŞA JINÊ

Her zanist û hizira ku nû bi pêş dikeve, bi giyanê dema xwe dihese. Jineolojî weke zanisteke ku di sedsala 21'ê de bi pêş dikeve, dê giyanê şoreşa jinê bide xuyakirin. Dê hem şoreşa jinê beralî û xwedî bike, hem ji vê şoreşê bandor û xwedî bibe. Sermayedarî, bi fermana "destpêkê li jinan bixin" dixwaze naveroka sedsala 21'ê bi mirin û kuştina jinan dagire. Ramyarê civaknasiya azadiyê Abdullah Ocalan, bi bangewaziya "destpêkê jinan rizgar bikin" dixwaze vê sedsalê bi wijdana şînkirina jiyana jinan, watedar bike. Jineolojî dê bi vî wijdanî bi pêş bikeve.

Ji ber ku tevgera jinê, tevgera sedsala 21'ê ye, şoreşa jinê, mijara sedsala 21'ê ye.

Li vir em dikarin bipirsin, gelo şoreş pêwîst e yan na?

Ji ber ku ev doz ji dozên civakî yên herî tevlîhev in, ji ber vê yekê ew şoreşê dixwaze û diyar e ku dê şoreş hişmendî be.

Ev hawirdor (dunya) pêwîstiya wê bi şoreşeke ku jin bi rê ve bibe, heye. Şoreşeke li dijî tundiya li ser jinê, şoreşeke dijî zilm û zayendperestiyê, şoreşeke ji bo mafê fêrkirin, karkirin, zewac û rêzgirtina ji kesayet û hebûna jinê re, heye. Ji ber ku jin nîvê civakê ye û nîvê din jî perewerde dike, şoreşa hevjiyana azad avakirin û gihaştina azadiyê ye.

Heger mirovahî, ji niha û şûn ve gaveke girîng bavêje, dê vê kûrahiyê ji aliyê jinê ve bi dest bixe. Roja me disepîne ku mirov dê pêşengiyê bide şoreşa jinê ya sedsala 21'ê. Dirûşma: "An jiyan, an hovîtî" vê şoreşê disepîne. Çawa ku civaka Rojhilata Navîn, pêwîstiyê bi şoreşeke duyem a gund û çandiniyê dibîne, pêwîstiya vê civakê bi şoreşeke duyem a jinê jî heye. Her du "pêwîstî" yên di vê destnîşankirinê de hem sedema derketina jineolojiyê ne, hem jî çavkaniyên bingehîn ên ku jineolojî jê xwedî bibe û bi pêş bikeve. Pêşketina jineolojiyê, dê bandorê li giyanê dema şoreşa jinê bike. Pêşketina jineolojiyê, dê şoreşa gund û çandiniyê ya duyem a ku pêdiviya civakê ye û şoreşa jinê ya duyem e, bilez bike. Di heman demê de pêşketina şoreşa çandinî, gundewarî û şoreşa jinê, bi pêşketina jineolojiyê wateyekê dide jiyanê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Bi giştî şoreş tê çi wateyê?

2. Çima pêwîstiya Rojhilata Navîn bi şoreşa jinê heye? Binirxîne.

Ş. ŞÎLAN KOBANÊ

Xwest di kesayeta xwe de projeya bîrdoziya azadiya jinê bigihîne serkeftinê. Bi guhertina ku di kesayeta xwe de çêkir, şoreşeke civakî û jiyankirina felsefeya Ocalan pêk anî.

FERHENGOK

PEYV	ŞÎROVEKIRIN
Aheng	Lihevkirin, nedijberî
Heyberî	Tiştên madî yên ku bi çavan tên dîtin.
Derbirîn	Ravekirin, îfadekirin.
Diyalektîk	Cedelî, rêbaza birêvebirina hiş e ya ku bi kêrî lêkolînkirina rastiyan û nakokiyên wan tê. Her wiha, li rêyên derbaskirina van nakokiyan digere.
Etîk	Sinc an exlaq, tiştên ku di nava civakê de tên pejirandin.
Estetîk	Bedewî, delalî û zanista xweşikbûnê.
Empatî	Hevxemî, xwexistina şûna mirovekî din (hîskirina mirovan).
Form	Teşe, dirûv û şekil
Genetîk	Genenasî, zanista genan (cînat), zanista xwendina zikmakiya zindîweran.
Gengaz	Mûmkin e, tişta dibe ku bibe.

Mîrate	Mîras (malê ku ji zarokan re dimîne, piştî ku dê û bavên wan dimirin), kelpûr.
Perspektîf	Lênêrîna hizirî, helwest.
Rêje	Nisbe, par, parçeyek ji tevahiyê.
Rewanî	Giyanî, derûnî, tişta têkildarî derûniyê.
Sentez	Du tişt yan zêdetir digihin hev û tiştekî nû ji wan çêdibe.
Statû	Cih û rewş
Takekesbûn	Tiştên kesî yan tiştên girêdayî kesekî, ne girêdayî komekê ye.

BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

HEFTÎ / MEH	HEFTIYA YEKEM	HEFTIYA DUYEM	HEFTIYA SÊYEM	HEFTIYA ÇAREM
REZBER			Têgeha jineolojiyê	Têgeha jineolojiyê
COTMEH	Zanist û zanîn	Gihaştina wateya jiyanê	Pêwîstiya jineolojiyê	Pêwîstiya jineolojiyê
MIJDAR	Bi zimanên cuda peyva jinê	Jineolojî û xwezaya jinê	Jineolojî û xwezaya jinê	Nasname û hebûna jinê
BERFANBAR	Nasname û hebûna jinê	Hebûna jin û mêr di jineolojiyê de	Hebûna jin û mêr di jineolojiyê de	Zayend û zayendperestî
RÊBENDAN	Zayend û zayendperestî	**LÊVEGER**	**BÊHINVEDAN**	**BÊHINVEDAN**
REŞEMEH	Zayendperestî	Zayendperestî	Jiyan û zayendperestiya civakî (1)	Jiyan û zayendperestiya civakî (1)
AVDAR	Jiyan û zayendperestiya civakî (2)	Jiyan û zayendperestiya civakî (2)	Azadkirina zayendperestiya civakî	Jineolojî û çanda dayîkê
COTAN	Jineolojî û çanda dayîkê	Çavkaniyên jineolojiyê	Çavkaniyên jineolojiyê	Jineolojî û şoreşa jinê
GULAN	Jineolojî û şoreşa jinê	**LÊVEGER**		